Ji pirtûkxana Casimê Celîl 5

H. Hayrapêtyan



# Teyr û tû

Wien - 2012

Çapkîr — Înstîtûta kurdzanîyê - Wien (IKW)

**H. Hayrapêtyan: Teyr û tû**

Werger — *Casimê Celîl*
Lîtograf — *A. Mxîtaryan*
Weşana pêşin — 1936 Rewan
Karê kompyûtêrê — *Lûsîka Gêrman*
Mîzanpaj — *Cemal Celîl (Alionis)*




ISBN 3 - 902185 - 26 - 0


Ji pirtûkxana Casimê Celîl 5

H. Hayrapêtyan

# Teyr û tû

Werger: **Casimê Celîl**

**Wien - 2012**



Navê wê çîye?



Çivîkek heye çûçike,
Bedena wê glover,
Nikul kine û qalin,
Şîrîn dike çiveçiv.



Çivîkek heye baxçada,
Xwe piçûke reng gewr,
Em wê hindik dibînin,
Lê kilama wê zef xweşe.

Çivîkek heye zû çûyî,
Biharê teze ew tîne,
Nêçîr dike bi firînê,
Hêlûn çêdike cem merîya.







Teyrek heye sipîye,
Stû dirêj û zirav,
Ling şidyayî nebedew,
Lê difire zef kubar.




Çivîkek heye çiveçiv,
Poç dirêj bi gime-gim,
Herkê ku hûn wê hînkin,
Wê mîna merya xeberde.




Teyrek heye reng-rengî
Ew xeber dide, nastirê,
Welatê germda ew dijî,
Zef cara cem me nave.



Teyrek heye rojê kore,
Deng derdixe bi melûl,
Nêçîrê dike bi şevê,
Bi neynûkê xwe zef zorbe.




Çivîkek heye poç dirêj,
Mal û hêlûn hiz nake,
Havînêra ew timê diçe,
Ew tu cara hêlûnê çênake



Çivîkek heye qasî mirîşkê,
Cî hizkirina wê qeya û zinare,
Goştê bi tem ew dide me,
Baş distirê, lê xuya nake.



Teyrek heye şeroke,
Ew mîna  diza miqate,
Çivîkxure, wan dukuje,
Merî ji wî hiz nakin.



Teyrek heye qasî golikêye,
Qeya zinar ew hiz nake,
Qûmistana tave şewatda,
Mîna hespê dibeze.



Teyrek heye zef mezin,
Nav ewrada ew dijî,
Li zinarada hêlûn çêdike,
Golik û berx didize.